

SAL^W4
HEJMAR 28

1945
ADAR

RONAHÎ

ANNEE 4
NUMERO 28

1945
MARS

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

TELÉFON:
Ya Malê : 12-29 Ya Çapxanê : 32-10



ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1945

DI VÊ HEJMARÊ DE

Kiso û kîvrosk	Çirokbêj
Bi kurtî jîna min	Cegerxwîn
Perçeyên canê mirovan	Bijîskê Mîran
Qewraşa général	Silêmanê Ferho
Nêçîra Berazan	Qedri Can
Paris	Silêmanê Ferho
Selahedin	Osmay Sebri
Napolyon	Osmân Sebri
Katérin	Bişarê Segman
Jî lawan ra	Ihsan Nûri
Riya Ezmanan	Pisporê Eskerî
Hindîk Rîndik	Xeberguhêz
Çira Zanînê	Herekol Azizan
Hinek jî Henek	Yariker
İngîlaba sor a mezin	Q. Can

Ciroka kurdmanet:

KISO Û KÎVROŞK

Carekê kiso û kîvroskê şert kirin gotin, ki berî giha silan giri ê mayî ewê silan tiştî bid ê. Rabûn her diwa wiло tîfaq kirin.

Kîvroskê go, ez bi lingê xwe ewle me, çi çaxê ko mi xwest ezê bigihim cihê nişandayı. Lé kî... hema çawa, li hev hatîn, ewi da rê û çû cihê ko goti bûn.

Axir kiso bi meşâ xwe a hêdi giha cihê malîm û kîvrosk li vir çerî û li wir av ve-xwar û li der ha raza.

Ji ber ko kîvrosk, bi lingê xwe ewle bû bi vi awayi xwe ji bir kir. Carekê bi xwe hesiya, gava bûye évar, hema da xwe ñ ber bi cihê ko li ser şert kiri bûn bezi û çû, dit gava kiso li wir pal dage. Kîvrosk poşnan bû lê tî qedîha bû. Kiso ew bi şert bir.

MIZGİN

DIWANA CEGERXWİN KETE ÇAPÉ

Kîtêbxana Hawarê, vê paşiyê diwana şairê me ê milî seyda Cegerxwîn xistiye ç: pê. Herçend cap bi xwe rûyê çapkeran spî neke ji diwan bi xwe rûyê miletê kurd spî û rûmetâ wî bilind dike.

Behayê wê pênc lireyên surî ye. Heq bi postê ji xwediye Hawarê re rékin û diwanê jê bixwazin.

Bi kurtî Jîna min

Sala hezar û nehsed û sê ez hatim dînyayê, Bi navê sultan Şêxmûs ez çêbûme ji dayê. Heta bûm sêzde salî li gundê me y Hesarê, Jîna xwe min diborand paşê ji wê me da rê. Bavê min ê rîsîpî xwedî mirov û rûmet, Ne mrovekî malgenî bi namûs û bi xîret. Ji tengasi, necarı me ew gundê xwe berda, Hatin Amûda rengîn, bavê min zû emir da. Diya min a helengaz pêncî salî dilovan, Salek pişî bavê min ew ji li wî bû mîvan. Birayê min ê nîvmele ji alema rohanî, Rast û dirist çi bêjî ew tiştekî nîzanî. Wî pireka xwe anî bê wijdan û bê mijî, Bi gotinêna xwe ên cors, ew min bê derb dikûjî. Xweşka min a xwendewar bê insaf û bê wijdan, Ez reviyam hatim cem wê ji ez kirme şivan. Geh li vir û geh li wê, min ezabek mezin xwar, Ya El-lah û ya Xwedê paşê bûme xwendewar. Jîna min ya kevnar idî hatê guhartîn, Tev xweşî û zanebûn heft hêt sala hin bi hin. Min dest bi kurdîye kir peyda kirim cend mirid, Bi xweşxwan û reşbelek xesma pişî Şêx Seid. Paşê çûme Iraqê ji wê ez çûme Iran, Heçî kesê bidîma ji min dimane heyran. Berî sala rehmetî bi çar salan dilbirşn, Di şîre de navê xwe min datanî cegerxwîn. Min icaza xwe sitand bi serbestî mîranî, Ji nû keça xalê xwe ji Hesara xwe anî. Bûm melayê Hasda jor cibepoş û ser bi şas, Ji nû riya rast û xweş bû ser jor û rîl û kaş. Min bi dûvî dinê girt, vîna wê keçî dîlê min, Barê gund û ê kulfet, hemî ket ser milê min. Paşê hate bîra min ko ez bibim xwedî gund, Dilê min jî gote min gelek baş û gelek rind. Min ji axa Cizîrê du gund girtin kul û xem, Navê yekî Çelek bû, êdi me kir Cehen-nem. Di nav me de ne ma bûn ne axa û ne kexwe, Elo Çelo kum bi qul, min tev kirin wekî xwe. Roja me gund ava kir kete rastê mixtarî, Gundan me bûn berberî dijminahî, neyari. Tevan girtin darêن xwe bûne weke gurîn har, Ji wî bextê min ê reş kurê Potê bû mixtar. Sermîyanê wî derew li ser wî bû berberî, Wek Dûçeyê talyanî paşê wî ji bi xwe de rî. Xwedî mal û xwedi gund li bergîlê bû siwar, Ré jê xiste mala xwe Tiro paşê bû etar. Pişî ilmê xwe ê pir bûm Dodoyê qulingvan, Bûm hevalê kum bi qul kurê Potê sermiyan, Ev cihana xapînok heta me jê xwe nas kir, Çi b'kim fêde ne maye emrê xwe min xelas kir. Cîma rastî dibêjim li nav dîna bûme din, Heta bimrim ji nû ve, xelk ê bêjin Cegerxwîn.

PERÇEYËN CANË MIROVAN

pişti serê 1914 1918an sinbetê çêkirina dest û lingên sinhi, bi gotineke gelempêr çêkirina lebatêni (iziw) sinhi gelek ber li pêş çû bû. Ji mirovén seqet re yên ko dest an lingekî wan di şeran de hati bû birin an şkénandin, ji pola, hesin û textê, dest û lingine welê çédikirin ko ew mirov bi wan lebatêni deskut (sinhi) ne bi tenê diçûn, dihatin; dixwarin, vedixwarin, lê li gorî destxetên xwe bi işe xwe ji mijûl dibûn, dixebeitin û bi keda destê xwe dijîn. Hesinger bi desteki sinhi hesin dikuta, xerat bi desteki hesini dep û texte dibirin h. p.

Ji aliye din ji yên ko ji çaveki dibûn re çaveki pipog çédikirin. Mirov bi wî çavî ne didit; bi tenê kortika çav pê dihate dagirlin û tenasiba rû yek-

car xerab ne dibû Carin; ji ji yekî difinbirî re ji goştê milê wi difnek çédikirin. Perçak gost ji milê wi dibirin û bi difina wi ve dikirin. Di vê emiliyatê de milê birîndar cend rojan bi seri ve girêdayî dima. Heta ko goştê biri di difinê de cih dibû û xwîna ko tête difinê di vî perçê gost de digeriya.

Lê iro, tebabeta şerê iro dicerbibeji lebatêni mirovén mirî istifade bike û wan lebatan deyne şuna lebatêni seqetan yên ko çav dest an lebatêni xwe ì din di seri de winda kiriye.

Berf cend mehan di Nûyorkê de emiliyateke welê çêbû ko xelk tev de lê ecêbmayî man. Jinikek hebû; wê jinikê ji beriya deh salan de çavên xwe winda kiri bûn. Diktor reşikên çavên unika

kor bi reşikê çavên mirovén mirî guhartin. Bi vê emiliyatê jînika kor sax bû û gihaşte binahîta xwe.

Li gora pisporêñ emêrikanî, ji niho û pê de tebabet wê bikare lebatêni miriyani bi kar bêxê û wan deyne şuna lebatêni mirovîne din. Dibêjin ko ew lebat ji bedenê miriyani bêne jekirin û di mexzeneyîn cemidi de dê bêne hilanîn. Ji niho de xestexaneke Nûyorkê ji bo hilanîna çavên miriyani mexzenekê çédikin.

Ji aliye din diktorêni rûsi ji di vî warî de xebateke zor dixebitin. Ji bo guhartina lebatêni mirovan li ser heyyawan tecribena çédikin. Di miesesa Gorgi de, rabûn zikê begina vekirin û dilen wan began bi dilen begine din guhartin. Begêñ dilguharî bi mehan ve emir kiriye.

Diktorêni rûsi di enya rohêlê de ji komen cendekan şebfine mezin bi dest xistine. Xwîna wan cendekan girtine û ew xwin di şisan de hilanîne.


Bi vî awayî li şuna ko li mirovén ko diwxazîn xwîna xwe bidin nexwêş û birîndaran bigerin, xwîna miriyani li nexwêş û birîndaran şîringe dikin. Ji aliye din diktorêni rûsi hestiyen kuştiyan ji wan dikin û wan ji birîndaren hestîşkesti re siwar dikin. Bi gottenî din perçeyen canê mirovan yên ko nema bi kêt têne wek perçeyen timobilan yên ko şikesti ne, bi perçeyine din diguhêrinin. Bi tenê perçeyen timobilan di fabriqan de têne çekirin. Lé herçi perçeyen canêni mirovan ji bedena mirovén din divêt bêne girtin. Ji ber ko fabrika perçeyen canê mirovan li cem Xwedê ye.

Diktorêni rûsi û emêrikanî di vî warî de gelek tecriban çédikin. Ra û damarêni mirî û kuştiyan li mirovén zindî diteimîn. Bi gottenî diktorêni zana diwxazîn perçeyen bedena mirî û kuştiyan di mexzenan de wek perçeyen timobilan hilinîn û wextê ko ji yekî re getek bû perçeki jê bigirin û li mirovén nexwêş an birîndar biteimîn.

Ez iro di dewra tecribê de vî Ser ji ji van tecriban re çekî misaid e. Ji ber ko hero ì iezaran kuşti dikevin desten oran û diktor dikarin bi wan lîşîyan her tecribê bikin.

Bêşik, ev tecribeyen ha, pişti seri şekîyen xwe ên gihaşti dê bidin.

BIJİŞKÊ MIRAN



Qewraşa Genêral

Yek ji bajarên rûsi yén ko di vî seri de deng dane; bê şık Smolensk e. Di Bihara sala 1941ê de elemanan Smolensk vegirti bû û jé dirêjî Moskoyê kiri bûn.

Wextê eleman nizingî bajér bû bûn, hâkimê bajér ê eskerî genêral Yasû bû. Serfer-mandarê eniyê jî merêşal Timoşenko bû. Timoşenko bant Yasû kiri bû da ko jê re ji bo midafea bajér talimatina bidit. Genêral qû bû gerargaha merêşal û jî bi talimatên gerek vegeriya bû Smolenskê.

Wextê genêral vegeriya, kevaniya wî jê re da bû zanîn ko ji bo îşen malê keçikeke poloni peyda kiri bû. Kevaniyê wesfê keçikê da bû; genêral ji qim pê ani bû.

Dotira rojê genêral eskerên xwe wê testîş bikira. Genêral bant cêriya polonî kir û çakêlê xwe da-yê, da ko jê re bikewine. Pişti nitro genêral qû bû nik erkânherbén xwe da ko plana berevaniya (midafehe) bajér ya ko ji gerargaha merêşal Timoşenko ani bû, ji wan re bide zantin. Wextê genêral li planê geriya û ew peyda ne kir; hate bîra wî ko plan di bêrika çakêlê ko jî bo kewandinê da bû keçikê de mage. Di cih de bant keçikê kir û çakêl jê xwest. Keçikê çakêl ani, genêral bêrik seh kîrin; plan ne tê de bû. Genêral bi kerb û xezeb li rûyê keçikê nihert. Keçikê xwe tev ne da û ne lebitî ji. Bi xwîneke sar gode genêral:

— Min gelek bala xwe da úlikirina çakêt. Ez welê hêvi dikim ko genêral ji min razî ye.

Genêral qîr kir û gode keçikê: Di bêrika çakêlê min de kaxezek hebû; zû bêje te ci jê kir. Bi tenê gotina rastigê dîkare te ji mirinê xelas bike.

Keçikê dîsan bi xwînsaryê lê vegerand û got: Min ne adet e ko ez bêrikên xelkê tev bidim. Ji lewre kaxzeza ko cenabê genêral dibêje min ne dittiye.

Genêral emrî zabitên xwe kir, keçika poloni seh bikin. Zabitan keçik çend caran seh kir; lê bi ser wê de tiştek peyda ne kîrin.

Genêral bant kevaniya xwe kir, mesele jê re got û ew digel keçikê di odekê de bi tenê kir da ko kevani ji nû ve keçikê hûr û kûr seh bikit. Gelek ne borî qîrlî bi wê odê ket. Genêral û zabitên xwe deri vekirin û kétin hundir. Kevant li erdê dirêj bû bû; ji difna wê xwîn dihat; keçik jî berê xwe da bû derti û dikir

ko bireve. Teqîna şejderbekê hate bihtstîn; keçik li ber sélâna deri keti bû erde. Genêral ew kuşti bû.

Genêral beriya vegartina keçikê ji polisa siri di heqê keçikê de raporek xwest. Pişti şeq saelan polis rapporta xwe berpeyl genêral kir. Keçik ne poloni lê romanî bû. Beriya ko elemanan dirêjî Rûsyayê bikin bi du mehan keçik hati bû Smolenskê û di kazinoke Smolenskê de reqast dikir. Ji ber ko keçikê bi awakî neqanûnî cinsiyeta rûst gîrlî bû, polisê da bû pey û lê hûr dibû.

Ji aliye din raporê dida zantin ko keçik pişti ko keti bû xizmeta genêral jî qutbirîya xwe ji kazînogê ne kiri bû û du caran qesta wê kiri bû.

Genêral emîr da ko cendekê keçikê li ser hisabê belediyê di gornistana biyanîyan de veşerîn. Herçi rojnameyên bajér mesela keçika polonî nivisandin û dane zanîn ko plana ko keçikê dizi bû nema bi dest ket.

Pişti nitro şevê pasvanên gornistanê ji nav tirban dengin bîhistin. Qey hinan erd dikola. Pasvanên gorri canê çar peyda bûn. Her çar derketin û ke:i nav gorinan. Şeveke heyveronê bû. Sê peyda û jînikekê hêdika tîrba qewraşa genêral dikolan; derbek lêdixistin, bîhnêkti dîsekinin û li dora xwe dinihertin.

Pasvan peş şewîn û elam dan kerekona taxê. Polisan dor li gornistanê girt û berê xwe da tîrba keçikê. Peşayen ko tîrb dikolan wextê bi hatina polisan hesîyan dane şejderbêñ xwe û agir kîrin. Poltsan li wan vegerand; bû ser. Pişti ko qedere nitro saetê li hev xistin polis û pasvanan ew gîrtin.

Di tehqiqtê de jînik mikur hat û her işt gotin. Jinik bi xwe xweha qewraşa genêral bû; her sê zîlamên din ji lîtwant bûn û tev de li ser hisabê Elmanya'yê dixebeitin û casûst dîkirin.

Jînekê digot: Me di ceridan de xwendî bû ko xweha min plan dizi bû û genêral ew kuşti bû, lê plan nikari bûn peyda bikirana. Min û hevalêni xwe me dizanî ko xweha min kaxezine welê bi qîmet di ciheti welê de vedişêre ko na-yête bira tukest. Ji lewre me dixwest em cendekê xweha min derinîn û di cihê bi me nas de kaxez peyda bikin.

Li ser vê yekê genêral emîr da û cendekê keçikê kelaştin. Plan di quleke welê de hate ditin ko Xwedê ew qula germ ji bo karekt din asirandiye.

SILÊMANÊ FERHO

NÊCÎRA BERAZAN

Em di rê ên bi devî û bi kelem re diçûn; di gelek newalên kér, di pir zinarên biliñd, di hevraz û hevjérén dûr û dirêj re derbas dibûn.. ez û du hevalên xwe bûn. Sehêñ me bi me re, tifingén me li milê me, rextén me li piştä me bûn. Destén me bi lepik, lingén me bi goreyên rişini û bi pêlavân xurt nixumî, bedena me bi çekên tekûz girêdayî bû. Zivistan û çele bû. Em diçûn çayê mancêlê, nêçira berazan.

Ev ne cara pê ìn bû; gelek carê din em bû bûn rîwyîn vê reyê. Nêçira berazan, ji me re bû bû meraq û serguzeştek.. me, ji vê serguzeşte heweseka derûni distend.

Bi roj, em dimeşîyan, bi şev ji em di şikeftande diman. Pişî sê rojan, me nêzîkî li armanca xwe kiri bû.. ber bi évarê bû.. dinya pir sar bû.. em gelek westiya bûn.. lê me nêzîkî li şikefta «govê» kiri bû.. gava em bigîftîna şikeftê me zû ji xwe re agirek dadaya, xwe germ û rehet bikira...

Em, gihiştin ber şikeftê. Lê mixabin şikeft, ji bextê me re, hilweşîya bû. Di wî ciyi de tu şikeftê din tu ne bûn.. em, nikarîbûn, bi şûnde ji vegezin; di şevreşê de, di wan rîlênen bi kevir-kuç de bi rêveçûn ne mimkin bû.. tebayên kûvî û derende ji bê hed gelek bûn. Çar ne çar.. me xwe da ber

latekê; cî pir teng bû, têra hewîna me û sehêñ me ne dikir. Bi dişwarî me xwe bi cî kir û me agirek dada.

Pişî şîvê bayekî res dest pê kir.. peşkén baranê hatin.. her ke çû ba bêtir, baran zêdetir bû. Agirê me vedimîri, canê me sil dibû.. em, ji serma diqefşîn. Sehêñ me ji, diricifin, teriyên xwe dikirin nav lingên xwe, beren xwe ber jor ve dikirin, û kûr, kûr di zûriyan. Xuya bû, înzara encameke xerab di dan me.

Herke çû, şev, res û tarî, ba û baran bêtir dibû. Tenê gava birûşkan vedidan, me kanî bû ber xwe bidita... Em ditirsîyan ku tebayên kûvî bi ser me de bigirin û me şerpeze bikin.

Nîvê şevê ba kem bû baran sekini.. ewrên res perçê perçê belav dibûn.. li cî ciyan histérkan xuya dikirin.. xwîn û taqet li me vedigeriya. Lê qederek derbas ne bû, li şûna ewrên res, ewrên spî û bilind çebûn; bê gûman ewrên berfê bûn.

Bi destê sibê re lepe-lepe berf hate xwar, dinya ronî dibû; me kanî bû ber xwe bidita.. Me xwest ko em, bêlan «merhele» kê bi şûn da vegezin, û berf felaketeke em xwe bigîftînin şikeftekê. Em li rabûnê bûn, kerîyek beraz li me der bûn.. ew berazén ko berê quncik-quncik ji ber me direviyan, vêcar har bû bûn û xwe dirêjî me dikirin.

Me, her sê hevalan pişten xwe dan hev û me berê tifingê xwe bi wan ve kirin. Sehêñ me ji; ji me re dibûn siper; mîna pilingan dajotin ser wan. Cengek mezin û no di nav me de çebû.. berikê me diqidiya lê hejmare berazan, çigas dihatin kuştin ji, bêtir dibûn; kerî, kerî dihatin gazi û hewara hevalên xwe. Berf pêde dibariya.. bager û pûkek ecêb çebû bû, niva ne tenê beraz, ji her çêşidî kûviyên derende xuya dikirin.. Wan ji bi çavekî birçî, dirêjî me û sehêñ me dikirin. Edî, berikê me qediyan. Vêcar, me



singuyên xwe bi ser tifingê xwe ve kirin. Qederekî bi dest-lepê ji me li ber xwe da. Paş vê tabê taqet di me ne ma; em her yek li ciyê xwe ketin. Berê her sê kükikê me hatin kuştin.. paşê her du hevalê min. Küviyan, cendekê wan, bi erdê re dikişan, û dibirin. Ez keti bûm kortalekê.. berf li ser min tije bû bû.. ji ber çavén küviyan wenda bû bûm. Her ko dicû berf, li ser min bêtür, barê min girantir dibû; min nikarf bû xwe tev biliwanda. Lê vêcar min ne sar bû; mîna di nav kurkelî de bim, canê min germ dibû.. bîna min dici-kiya.. di nav kefeneki spi û tebis de, hêdi-hêdi dimirim.. hêvi û çara xelasê ne ma bû. Gava meriv li ber candayfnê be, hemî ser-hatin u serenamê meriv mîna şîrştên sîne-mayê li ber çavén meriv derbas dibin. Di wf hali de gelek tişt dihatin bîra min.. masfir ev dengê ahengdarı ku berî bîst û çend salan gava ez büçük bûm min, tim dibihist: «Elahi heq... Mewlayî heq... Rizayî heq...»

Ev dengê derwêşeki cil-kesk bû; hersal, du-sê caran, û her carê ji nişkave xuya dikir. Beju-dirêj, esmer, ri-sor bû.. elbê wf kesk, kum û xavika wî kesk bû.. tizbiyek kesk û balagir di hustiyê wî, keş-kûlek ji gwîzî hindê li milê wî, cilakefi dirêj û ser-hesin di destê wf de bû.. kûçe, kûçe digeriya û bi dengê xwê é ahengdar ban dikir: «Elahi heq.. Mewlayî heq... Rizayî heq...» Her kesî, jê re zarokên xwe dianin.. wf ji, destê xwe î pîrozî di ser serê wan re digerand.. Mala her kesî mala wî bû; li her cî kanf bû raketa, li her cî kanf bû bixwara. Pira min bi xwe pir xatirê wî dizanî bû; pere û xwarin ji wf dirîx ne dikir. Wî ji, destê xwe li ser serê min digerand, bi dizî tiştek dixwend û pif dikir dora min.



Di peravan de tevgera komandosan.



Eskerên hevalbendan ji vaporan dadikevin beja Ewropayê.

Gelekan, ji wf re, digotin:

«Xalé xizir e.. ji nişkave xuya û ji nişkave wenda dibe.. di rojekê de kane dinê hemî bigere...»

Di bin tebeqeyên berfê, de, hilma min dicikiya, xwêdaneke germ ji laşê min bider-diket. Hingî birê wisan dihatin heşê min û berge «menzere» yêl welé dihatin ber çavê min.

Ez, di nav muhîteki dindar de, xwedî û mezin bû bûm, baweriya min hebû ku ew derwêşê cil-kesk, ew xocê xizir bê fîmdada min û min ji mirinê xelas bike.. ew derwêşê xwedî keramet û xwedî mûcizeku di rojekê de kanî bû li dinê gişî bigere, kanî bû di wê tengayîye de bê hewara miridê xwe î kevin.

Ez di vê hêwiye de bûm, dengek ji hatif hate guhê min, digot:

«Metirse, ez hatim», min li jor nêri; tebeqên berfê ji ditina min re manî ne dibûn.. min dî, ji jor ve murxekî gir, guş, guş difire û ber bi min da dikeve.. paşê li ber min venişt.

Min, bi hêviya xocê xizir dilê xwe vejândi bû; min digot qey derwêşê min û cil kesk û keşkûbi dest e.. mixabin murxekî per-dirêj, sîng bi purt, û ser girover û ser mezin bû..

Hingî hêviya min şkest; bê guman ev murxekî berate «cenaze» yan bû.. berî ez bimirim, bîna min hilaniye û hatiye cendekê

min bixwe. Lê murxê gewre, murxê pirheybet ne ji wan murxên beratan bû; pençê xwe î polayı, bi dilovanî, li ser serê min gerand û ez avêtîm ser basikê xwe î hesinî û ez ber bi ezmanan firandim. Èdî tîrsa min ji mirinê ne ma bû; bi çavekî jîndar û bi dilekî azad min li dinê dinêri.. .


Gava min çavê xwe vekir, min xwe li ser basikê tu murxan ne dit. Ez, li mala xwe, di nav nivîna xwe de bûn. Tixtoreki cil-spi serê min bilind dikir û bi kevçikî derman bera qirika min dida.. li rast û çep du sê merivê min bi tîrs li min dinêrin.. hêşir ji çavê wan diherikîn.

Tixtor dikeniya û digot:

— Èdî, metirsîn.. nexweşê me kefen cirand...

Heşê min, hêdi, hêdi dihat serê min.. ez ji bist rojide nexwes bûm.. nexweşîya min tifoseke giran û bê eman bû....

QEDRÎ-CAN



Tang û piyadeyên firqeye britanî ketîne nîzama şer û berê xwe dane asêgehîn aijmin.

PARİS

DI NAV DU HEZAR SALAN DE BIYANIYAN
JI 20 CARAN BÉTIR PARIS VEGIRTIYE

Paris, bajaré abadîn, bajaré çira û ronahiye bi destén zarowên xwe hate xelas kirin. Beîya ko ordiwén sondxwariyan bigehin Parisê, xelké payitexte sileh bi dest li vegetiyaran rabûn û ew ji bajaré xwe derêxistin. Bi vê hêncetê me dil kir vê bendê ber-peyî xwendevanên xwe bikin.

Belê di nav 2000 salan de biyaniyan ji 20 caran bêtir Paris vegirtye. Lê xelké Parisê tucaran bajaré xwe di bin lingan de ne hişt û hercar bi awakî biyani ji bajaré xwe derêxistin.

Beriya M. I. (mîlada Îsa) bi 52 salan qeyser Yûlyüs direjî bajaré golan kir û pişti şerekî no û dirêj Lotîs (navê Parisê è kevin) zemt kir.

Di dawiya sedsala* (qerîn) sêzdehan de împerator Diyoklisan welatê golan qedimande melfika Konstans Klor û Lotîs jê re kire payitext.

Di orta sedsala çaran de împeratorê romanî Jûlyan ew vegirt. Di sala 365 an de mîlîk Valentian Paris jê stand.

Di sala 451 ê de eskerên Etîla gîhaştin sûrehên Parisê. Pişti 40 safl melikê freng Klovis Paris vegirt.

Di orta sedsala nehan de fatihê Normandiye Lüdbrûg sê caran dirêjî Parisê kir. Qral Şarl yê ko bi Şarlê keçel deng da bû, bifidyeke giran Paris ji destê normandiyan xelas kir. Lê pişti salekê normandiyan cardî dirêjî Parisê kir, ketin bajêr xelk talan kirin û qesir şewitandin.

Di sala 885 an de qebileyine Normandiye din dirêjî Parisê kirin û bajar qedere sê mehan mihasere kirin. Pişti wê bi deh salan

qralê Germanistanê Oton kete Parisê.

Li 9ê Çîriya-paşin sala 1357 an ingiliz ketin Parisê û bajar talan kirine. Di sala 1360 de ordiwén Edward, qralê Ingîlîstanê gîhaştin dora Parisê û gundêndorê talan kirin.

Di sedsala panzdehan de li Fransê şerekî elhi çêbû bû. Ingilizan bi de tê birekî girt û li 24ê Gulanê sala 1418an, cardî ketin Parisê.

Di sala 1420 an de mîlîka Izayo deriyê bajêr ji Hanriyê pêncan, qralê Ingîlîstanê, re vekirin. Hanri keça qralê Fransayê ji xwe re anî û bi vî awayî bû war sê textê Fransê. Ji xwe bavê keçikê yanî qralê Fransê dûn bû. Heta zemanê Hanriyê şesan, kurê Hanriyê pêncan hikmê Ingîlizan di Fransayê de dom kir.

Di wextê Hanriyê şesan de qedîsa Jandark rabû, peya dan dora xwe û dirêjî ingilizên ko li Eransê bi cih bûn kir. Bû şer û di sala 1436an de fransiz di bin emrê Karl Danjû de ketin Parisê.

Di Gulanâ sala 1588an de eskerên Hanriyê siseyan, bi qesta derêxistana terefdarên mala Gîz ji bajêr, Paris mihasere kir. Pişti salekê qral di zikê Parisê de hate kuştin. Di vê navê de eskerên Hanri de Navar, Paris mihasere kiri be jî piştre jê kişîyan.

Di sedsala 19an de Paris sê caran hate vegirtin. Di sala 1814an û li 31ê Adarê ordiwén Nemse, Prusye û Rûsyayê ketin Parisê. Pişti şerê Watêrloyê, yanî pişti şikestina Napolion, sal 1815, Ingilizan l'arîs vegirt. Di sala 1871an de, di wextê Bismark*de prûsiyan Paris zemt kir. Lê ji ber ko fransizan tezmînata ko ji wan hati bû xwestin di cih de dan elemen gelek tê de ne man û jê vekişîyan.

Vê carê li 14ê Hizérana sala 1940 de ordiwén Hitler ketin-ê û qederê çar salan tê de mane.

SILÈVANÊ FERHO

Qayixa ko
di klişê de
tête ditu.
dimîne kele
kên n.e. B
ferqa ko y n
me ji cer-
mîn pezan,
ev ji hesin in



DİROKA JİNA SELAHEDİN

— 5 —



DEWLETA SELÇOQIYAN

Ji her têkiliya hin hadiseyên tarixî ji jîna Selahedin ra, me tiştek ji halê dewleta ebasiyan û kîliyek ji ji şerîn xacparêzan nivîsi bû. Ji ber ko dewrana dewleta Selçoqiyân dikeve pêşîya hikmê Selahedin, divê em hinekî, qene serpîkî, li ser halê dewleta selçoqiyan ji bişeyîvin.

Herweki me di feslén berî vî da halê xelîseyen ebasiyan goti bû, hîngê hikim keti bû destêن qumandarêن tirk. Dawiya-xurtiya serlegkeran û qelsiya xelîseyan hikûmeta selçoqiyan anf bû pê. Ew dewleta ko ji sînorê Eşanîstanê heya derya sîpî xisti bû bin destê xwe di welatê rohelerâ da, nemaze ji bo İslaman, qiwetekerê çak û xurt dihate nasîn. Ev welatê dûr û dirêj di bin hikmê melikê selçoqiyan ê bi nav û deng Meliksah û wezîrê wî ê jîr û jêhaft Nizam-el-milk da bû.

Nizam-el-milk bi zanîn û dûrbiniya xwe ew welatê mezin wekfî hingulîskê di tiliya xwe da digerand. Dema wezîrê eqilmend dit ko dewleta Selçoqî li ser milêن leşker û zabitten kole û cemekexwer [bi meas] rabûye, ji bo di hev da neketina wê pir tevdîrên baş danîn.

Piştî ko destê ereb û farisan ji hikim bi dûr xist, ji hêlekê hîmî hikim li ser rastî û dadweriyê dani; û li hêla din dilê qumandaran bi malbata Meliksah va girêda. Ci qumandarekfî ko bi karekî çak radibûn jê ra serdariya kelehekê an bajarekfî didan; ko vê yekê hezkirina xebat û vekirina welâtan dixiste dilê wan. Bê şik dawîya vê yekê digehêste parve bûna welêt di navbera mîr, qumandar û serdaran da. Nizam-el-Milk va yeka han ji bîr dibir û riya veqefînê, anê parvekirina welêt, li pêş dilbihewesên vê yekê bi hin tevdîr digirt. Berf her tiştî tu mîn an serdar ji bo demekî dirêj li ser keleb an wilayetekê nedîhiştin. Ji vê pê va berf demêtu wali û serdaran nikari bû dayîn bicivanda. Bi ser van tevdîfrê han da her gay nimînende û guhbelên wî di nav welêt da kêm ne dibûn û ji gunehekî biçûk ra çavên xwe ne digirtin. Ci serdar an mîrekfî ji rastîya wî diketin şikê, zûka haya Nizam-el-Miik dikirin û wî ji ew serdar li cihê tê da radikir û dişand cihekî din.

Lê mixabin ko ev tevdîrên han bi Nizam-el-Milk ra çûn. Herçiyêن hatin cihê wezîrê zîrek û eqilmend bihayê van tevdîfran nezanîn û mîrek û serdar di cihênen wan da hiştin. Mayîna mezinan demekî dirêj li ser keleb û bajaran destê wan û piştî wan zexim kir. Heya çû bi warekfî welê rawestî ko wan ji di bin destên xwe da mîrek û walfi datanîn û dayîn û xwik didan civandin. Çigas ko bi vî awayî hikmê selçoqiyan demekî dirêj dûm kir ji, vê nîzama han gelek hîviyên serxwebûnê diexist dilê waliyan.

Heya ko sultanê Selçoqiyan e xurt bûn hemfî waliyan jê ra serf datanîn. Gava bi xurt bûna waliyan qels bûn, serê ben ji destê wan flîfî û ew tiştî ko bav û kalên wan bi sed sala anf bûn pê di demeke nîzîk da berf da hilwesînê.

Dergehê malkambaxiyê di nav vê dewleta mezin da bi destê serek û qumandaran ve bû pêşîye bi berberiyê dest pê kir. Her serek an qumandarekfî çav da heqê heval an berberê xwe. Bi vê gelek gelş û qirêne ketin nav welêt û tîrsa hikûmetê ji dilê xelkê bi derket. Riya dizî û kelesiyê li ber neqencan vebû. Ew serek û qumandarê ko berê di destêne gencan da lêdaban, bûn hîvotker û piştîmîren wan. Her yekfî ji wan dixwast li dora xwe heval û bendewaran bicivîne. Di vê rê da ji berberiyekê kirêt keti bû nav wan. Ev yek bû ko rihefi di welet da ne hîst û kes ji can û malê xwe ne bawer bû. Halê welet pîs û



nîzam tilxiro bû, lîcaret vemirî, neçarî û belengaziyê ji nû va seri hilda û di her aliyê welêt da, wek cendekê pirbirin, avzêmén fesadî û gelaciyê vebûn.

Çiqas ko di nav van lihevketinan da carcaran yek yek destênen xurt bi derdiketin û serekfî hefsarê welêt di dest xwe da digirtin jî, bi çûy na wan destan disa halê welêt vedigerî ser dûzana berê, heye ko hîn xirabtir dibûn. Ji van destan ê xurtir destê Nüredin Zengî bû ko paşıya sultanên selçoqiyân bû; heye ko çaktırê wan jî tê zanîn.

Nüredin jî wek sultanên berî xwe ên ko di nav wan li hevkelinan da rabûbû, kesen zana, mérخas û jêhatî li dora xwe civandin û pê merkeza xwe xurt kir. Di demeke ko kesen jîr û jêhatî, mérخas û camêr, rast û xweyî rûmet, zana û siya li erdê ne diman, ne mikûn bû ko kurên Şadiyê kurd ji wê keyse bê par bima-na. Ji xwe Eyûb û Şergub ji demeke dirêj da keti bûn xizmeta Nüredin û xwe gihandi bûn payeyên bilintir. Tu şewreke Nüredin ne dibûn ko Necmedin Eyûb û Eseedin Şerguh ne di nav da bûna... an ne gerinendeyê wê kirê bûna.

Bi wî awayî bû ko kurê Eyûb Üstî Selahedîn Lî west û dijwarî di sera û diwanên padishahan da qavê xwe vekir û bi rabûn û rûniştina zanayên dora wan riya jîmî û mezinatiyê nasî. Herweki destê jîna Xwedê ew biçûkê ko li riya mihabiri-yê hate dinê û bavê wî dixwî st bavêtana, ji bo mezinatiya welateki şireh û dirêj digihand. Ji hélekê bav û mamên mérخas, di rex wan da govenda zana û eqilmendan, ji héla din danişwîrî û hogiriya sultan û weziran mîfrî biçûk Selahedîn kiri bû miroveki mezin; an ji bo mezinatiyê pêk tanîn.

OSMAN SEBÎ



DÎROKA

JINA NAPOLYON

« Mete ko hefsir teygera xwe »
 « bi dest jina xwe ve berde, bi »
 « qav min i kembijia ve. »
 Napolyon

— 12 —

BEXTÊ ÇAK

Hingé Napolyon Bonapartê ko berê général bû, wê gavê li kar û xebat li kîçê à kolanen Parisê digerî, hemî li çavên xwe didistin û agir bi hinayê wi diket. Wi qene dizanf ko heke serxwerabû sordest bibin dê şüres û herdanberdaneke mezin têkeve nav wîlât. Sisiliya le-kerê général Mîno ji, ne ji elametên xérê bû. Ew sisî bû ko hêla serxwerabûyan giran dida xweya kirin.

Gava général Mîno tevî leşkerê xwe li ber lehîya serxwerabûyan bi sun da herye seraya Twîleriyê vedi-kîj. Napolyon ji bi tena xwe li pê wan kete serayê û tevî guhdaran cù héreya (temaşa) qirênen (minaqese) kongire.

Evar bû, tariya gevê bazikên xwe êu reş di ser bajare Parisê ra vegirtin. Serxwerabû ji, pişti ko bi vekişina leşkerê hikûmetê dilges bûn, hidi hidi ji hev balav bûn û her kes cù mala xwe. Qanc bawer bû bûn ko gava sibetîre tişîng bête teqandin, leşker dest nabe xwe û lepekurt jê nayê. Hingâ kongire dê qisma xwe bi daxwazên wan bîne.

Napolyon heya sael yanzdehêن gevê guhdariya qir'nen koma kongirê kir. Hingé hemî lebatan ji ezla général Mîno re qerar da bû û parastina kongirê ji sipartin hevalê xwe Baras. Baras ne miroveki esker bû, lê geleki fî jîr û jêhatî bû. Wi mezinâsi û giraniya barê ser stoyê xwe bir dirib û dixwast li ser xwe rake. Demî di nav guhdaran da çav bi Napolyon ket, vegerî ser hevalên xwe û go-te wan:

— Peyayê ko bikari be kongirê biparêze ez dinasim. Ew zabitê korsîkiyê ko min ji Tûlonê nasf bû. Ha fî ev e di nav guhdaran da. Hon dikarin pê bawer bibin.

Piraniya lebaten kongirê Napolyon ne dinasîn. Ên ko navê wi bi vegirtina Tûlonê ra bihîsti bûn, mîna dêweki zexim di-anfn. Lî gava serekê kongirê xwast wi bibîne û hate



pêşberî wan, ditin ko peyakî qels û kiçik, û çavên mirov nagire. Serekê kongirê jê pîrsî û gotê:

— Ma tu dikarî parastina kongirê bigirî ser xwe.

Napolyon lê vegerand û got: — Erê.

— Giraniya barê ko tu hildigiriye ser xwe ma tu bir dibi ? !

— Erê, ez bi temamî bîr dibim. Adeta min e, ci tiştê ez li xwe bigirim herhal dibim serf. Lî şertekî min heye, divê hûn qebûl bikin. Ew ji ko kes têkîlî tevger û tevdîra min nebe û ez di kîren xwe da fî serbest bim.

Kongirê serbestiya ko Napolyon xwasîf dayê. Wi ji zûka di qışleyen rex Parisê da pêncî top anî li dor aliye avahiya kongirê (seraya Twîleriyê) daçikand û berîn wan da kûce û kolanen ko digehan serayê. Heya sibê Napolyon ling di bin xwe va nekir û her cihê topan saz dikir û leşker diêxîste deverén hewce. Bi birbanga sibê ra avahiya kongirê ji kelehekê xurtir û zeximtir bû bû. Carmedoren wê, ji devêñ top û tişîngan reş dikir.

Sibê zu, serxwerabû hatin wargehê berî rojekê. Wi cihê ko leşkerê général Mîno ajoti

bünê. Û bawer bün ko wê dîsa Mînôtayê sist li pêş xwe bibñin. Lê ne dizanîn ko généralê kiçik Bonapart dirêjiya şevê kara xwe kiriye û li benda wan dimine.

Piştî rojhelat cil hezar peya ji serxwera-bûyan di dorhêla serayê de gihane hev û dixwastin dirêji pênc hezar serberzê (Nefer) Napolon bikin. Gelekî hêvikar bûn ko weki roja berî wê çavê leşker bitirsinin û bi tegandina çend tifingan hemîyan ji çekan bikin. Dema gumrehê serxwerabûyan halan di hev didan û hîdi hîdi berve devê topan dicûn, Napolon qet xwe tev ne dida û dixwast hîn pirtir nîzing bibin û tifinga berê ew biteqñin.

Gava serxwerabûyan tu teyger û aridû ji leşker ne ditin, bê perwa dirêji kirin û çend tifing ji berdanê. Hînga Napolon agirê top û tifingên leşkerê xwe bi carekê berda pêşiran wan. Agirekî welê ko li ber wî xwe ragirtin ne karê tu kesî bû. Serxwerabûyan cîqas dixwastin ling bi ber xwe din ji, bi mirinê ra pêvgün ne tişteki hêsanî ye. Piştî saetekê ji wî cil hezarf çar mirov li pêşberî leşkerê hikûmetê ne ma. Napolon bi vê ji térr ne kir û leşkerê xwe li ser wan ne kîşand û heyâ nava xaniyan rapeyî wan kir. Heya êvarê piraniya çekêni serxwerabûyan ji dest wan bider ist û paşê bi serdestiyeke bê hemta vegevî avahîya kongirê. Li wir hemî lebaten kongirê hatin pêrgîna wî û jê ra rûmeteke mezin girtin.



Sibetirê ji milet ra dane zanîn ko généralê kiçik Napolon cimhûriyet parast.

Herwekî dema çînfîna havila hemî kirên Napolon hali be; her kesî kirên wî ên çak dianîn bîra xwe û digotin. Hecko Napolonê fro ne ê duh bûl. Ew généralê ko ji leşkeriyê hate avêtin, bê kar û xebat, rewş û rûmet di kûce û kolanê Parîsê da digerfî mirovekî din bûl.. An, xebatê ko di riya felat û serfiraziya Franseyê da li Tolonê û çiyayê. Alpê kirî, hîn nuh di xelkê û hikûmetê va dixewînîn. Mirov dikare bêje ko çira Napolon hîn nuh vêdiket û şewla wê xwe dida xelkê Frenseyê.

Li ser wê kira Napolon yarê wî Baras kete hikûmetâ gerînendeyan ko ji pênc lebatan hate pê û général Bonapart ji kirin serleşkerê hundirê welêt. Ev karê nuh, karekî mezin, bi rûmet û pirmeş bû. Napolon bi carekê ji jîna zîvari û belengaziyê filîti û kete jîneke çak û fireh. Bû xweyî qesir û avahî, berdevîk û xulam, hesp û erebe. Dema mezinên welêt bihafana jmarîn, ëdi navê wî ji di réza wan da dihate xwandin.

Gava rê li ber Napolon vebû û bext berê xwe dayê, berf her tişti diya wî hate bfrê. Xwast ko dê û birayê wî ji ji wê seifaziyê destkewî bibin. Piştî demekî kurt çû Marsîlayê nik dê, bira û xwîşkên xwe; da ko bextiyariya xwe bi wan ra parve bike. Di wê rojê da Napolon xwe ji gotina xwe kir xwedî. Ew gotinê ko piştî mirina bavê xwe ji diya xwe ra nivîs bûn hemî anîn cib. Hîngê, di dawiya reşbelekê da digot:

«Dayika delal; bîhna xwe bigire û dest bide ser dilê xwe. Halê ko fro em té da ne ji, xwe ragirtinê divê. Ji fro bi sün da emê bala xwe bidin te û qencyên te bîr bibin. Gava me kari bû hînekî arşkariya te bikin, emê bi wê yekê xwe pir bextiyar bîzanîn».

Cawan ko Napolon di her kar û warf da bi gotinê xwe rabûye; ji bo dê û birayê xwe ji bi gotinê xwe rabû û ewrên zîvari û belengaziyê ên malkambax nema li ser banê malbata Bonapart rawestin.

OSMAN SEBRÎ

KATÊRİN

ÇIROKA İMPERATORA RÜSYAYÈ A BI NAV Ú DENG

— 1 —

Nivisevan: S. A. Moreskwi
Wergerevan: Bişaré Segman

— Généralê min, tu qwitén me ne mane.

— Pyér; ev gotin ne rast e.

— Sed mixabin ko rast e. Bawer bike ji bo sibe tu xwarina me nfne.

— Heke ji bo sibe qwíté me hebiwa me ew díkîr qúté du rojan ú me du rojén din pê derbas dikirin.

— Généralê min, nakeve seré min ko ev tişt ji me re miqeder be. Di nav bajér de xelk ji nézan dimirin. Herç̄ esker ji kémzadiyé gill̄ dikin.

— Ma gelo ez jí gili dikim?

— No ez beni.

— Ma çire ew jí wek min nakin.

— Lé . . .

— Dosté min è eziz, qedera Litwanyayé di nav destén me de ye. Heke Maryénborg ket úris dê mizefer bibin. Ji lewre her roja miqawemeté di dilé me de imídâ zeferé vedijine.

— Généralê min destûr heye ko ez bi dilekf vekirf biştexilim. Tiştè ko ez dixwazim ji gênerâlê xwe re bibéjim, héj ew tişt ji devé min derneketiye ú bi guhê tukesi ve ne büye. Lé ev tişt rasif bi xwe ye.

— De bêje heyran, ez guhdariya te dikim.

— Divêt tu bi xwe jí bizanî gênerâlê min ko édi tu imkana miqawemeté ne maye,

— Ma çawan ev gotin ji devé zabiteki litwanî dertet.

— Belê Lé divêt em bizanfn ko dij-min li me wer hatiye; em ketine bin mihaseré. Dijmin ji me bétir ú çekén wan jí xurtir in-Di vî hali de em nikarin rabin berhîcûmê! Eskerên me ên nizamî di nav bajér de ne. Herç̄ çeteyen ko di çolê de digerin me tu hévî ji wan nîne. Di destén me de bi tenê firqa serheng Vladimfr Osboviç maye, ya ko ji destén i risan flitiye. Ew jí bi tena xwe nikare bera dijmin bide.

— Belê Pyér, heq di destén te de ye ú her tişt ko tu dibéjî rast e.

— Tu hévî nîne ko ji derive arşkariya me bikin ú ji me re erzaq bişinîn.

— Lé em dikarin ji xwedê hévî bikin.

— Belê em dikarin hévî bikin. Lé nakeve seré min ko Xwedê bi planén eskeri jí mijûl bibe.

— Lé dikare ji me re fikirine welê bidit ko em bi wan fikiran bikarin ji vî deravé teng derkevin.

— Heye ko em bikarin du rojén d'n ji miqawemet bikin.

Gênerâl hinekf xwe ker kir ú pasê gote refes erkanherbiya xwe: Hingê di jiýina min de du rojén din mane. Ez tucaran xwe teslimi dijmîn nakim. Édi tu dikarî herf Pyér.

Piştî çend deqîqan milazimeki ciwan keti bû gerargaha gênerâl. Nobetdaran jê re serif dibrîn ú pîte lêdixistin. Milazim li deriyê oda gênerâl da ú pişli ko ji hundir de destûr dan milazim deri vekiri ú ket hundir. Milazim pate lêxistü ji piyan sekini ú got:

— Roja te xweş bavê min.

— Ya te jí kurê min. Gelo bi te re ci xeber hene.

— Xeberine neqenc.

— Ji van gotinan mexseda te ci ye?

— Mexseda min, halê ko em té de ne. Em nema dikarin li ber vî hali bisekinin. Xelk ú esker tev de di newmîdiyé de ne; nema dikarin tehemil bikin.

— Tiştè ko tu dibéjî ez bi wan hemiyan dizanim. Di desté me de ji teslim bûné pê ve tu çare ne maye, ne we ye?

Gênerâl këlfkê damayı ma; paşê serê xwe hilda ú got: Lé halên newmîdiyé gelek caran ji minovan re fikirine neadeti ilham dikin.

— Ma tu çare heye ko em bikarin ji vê mihaseré xelas bibin.

— No, em ji úrisan këmtir in, peyayén me newmid ú westiyayîf ne. Em nikarin wan ji bo rûmeteke xeyalî wek pezan bidin şerjékirin.

— Hingê . . .

— Hingê Ji me re rêke bi tenê heye. Lé tiştè ko ez didim eqilê xwe ne işe eskerekî adeti ye. Jê re méréki qenc ú weletparêz di-vétin. Mérékî welâ ko bikare bêperwa xwe bike qurbana welatê xwe. Belê mirovekî wele dikare me xelas bike.

Lawik serê xwe hilda, sînga xwe da ber ú got: Ji bo xelasiya welet peyayé ko tu dibéjî ez im.

— Heyhat kurê min, tu bi kérî vî işî nayı. Jê re peyakî welê divêtin ko úris wî nas nakin. Heke me bikariya fermendarê ordiwa rûsi ji ser riya xwe hilinin hingê ji me re mimkin dibû ko em xetén mihaseré bikelişinin ú bi carekê ú digel ordiwa xwe derkevin dervey çenberê.

— Ma tu dibéjî ko pê úris xwe bidin paş.

— No, lê wextê úris fermendarê xwe winda bikin berdiberdan wê bikeve nav wan,

ewê xwe şas bikin. Em ji, emê ji vê fî sendê istifade bikin, emê xetên wê bikeleşinin û derkevin derive. Di wextê ser de ji ordiwekê re ne hésant ye ko ji xwe re fermandareki peyda bike.

— Ma çawan yekî lîtwanî bikeve ordûgaha rûst û xwe bigehine fermandarê wê. Beriya ko bigehine fermandar ew bi xwe wê bête girtin.

— Béle wî bigirin ji, beriya ko wê heps bikin wê bibin nik fermandar da ko ew jê di heqê me de pırsan bike.

— Welê be ji wektê wê bibin hafa fermandar wê bêxin bin mihafaza hin esker û zabitän. Ji milê din zabit wî seh bikin û çekën wî ji jê bîstînin.

— Be'ê rast e, lê heke jinikekê ev iş girte ser xwe,

— Jinikek,.. ma jinik blî çî hêncetê wê derbasî xetên di, min bibe.

— Ma dîtina sebeban ji tiştek e. Heye ko jinik çûye nav xetên dijmin da ko di nav hêşiran de li mîr an li destigirtiyê xwe bigere,

— Lê jinika ko ji bo vê yekî dê biçe nav dijmin, bikeve ji hafa fermandar nikare xwe pê re bi tenê bike, bi wi re di xelwelê de bîmîne.

— Ji lewre ji me re jinikeke welê divêtin ko ne bi tenê welatparêz û fî dakar bit lê divêt di yek wextî de spehî jî bit. Da ko Mençikof bi xwe dil bike pê re bi tenê bîmîne.

— Bi vî awayf wê bikare wf bikuje....

— Belê, wê bikare. Divêt di Maryenbûrgê de keçikeke spehî cesur u welatpanê bêle peyda kirin. Ev jî ne tşeki hésani ye. Dijmin casüsên xwe xistine heta ber pozén me.

— Ez jinikeke welê nas dikim.

— Ew kf ye?

— Katérfin..... xwediya kantfnâ firqa piyadan adidowan. Keçikeke bedew, welatparêz ya ko tucaran nabe xayîna welatê xwe.

— Ji min re qala mîräniya wê kirine; lê min keçik bi xwe ne dîtîye, heke tu jê ewle yi.

Lawik li bavê xwe vegeraed û got: Ev çend roj in firqa piyadeyan xêra navlîdانا Katérfin ji piyan sekiniye. Jê péve kes nîne ko bikare vi işî bibe serif.

— Bila be kurê min, ez ji rastiya hîkmân te ewle me; bişne pey keçikê

..

— Katérfinê !... vodka, vodka

Eskerên ko li ber deriyê kantfnâ Katérfinê sekîn bûn bi vî awayf bang didan û jê vodka dixwestin.

Keçikê bi ken digote wan: Zarono, ka

pere . . .

— Tu pere bi me re nînin.

Eskeran digot: Katérfin, divêt tu ji me re bîdfî, divêt em vexwin. Em birçîtiya xwe bi tenê bi şerabê dikarin, bixapînin. Wextê em mizefer bibin emê heq ðidin.

— Béşik, bêşik emê mizefer bibin.

Di vê navê de yekî bi dengeki bilind got: Katérfin ma Maryenbûrg ne hejayî şüşak vodka ye?

Kat'rînê berê xwe da wî xortê ko ev tiş goti bû û got: Li ser bextê min xebera te ye Ivan, tev de li siheta min vexwin.

Katérfinê xwe dahelande sendûqekê û jê súşeyekî derêxist û gote eskeran: Ji xwe jê péve ne maye ji.

Ivan ji par re li hundirê sendûqê dîni-hêrt. Katérfinê lê vege riya û got: Ma tu fehêt nakî; ma kengê min derew li we kiriye.

— Li min megire Katérfin, heq di destê te de ye; min qisûr kir.

— Ez di te naborim ehmeq.

Katérfinê dengê xwe birî û berê xwe da zabitî ko keti bû hundirê kantfnê. Ew zabit Fédor bû. Fédor gotê:

— Divêt jin banizan carina derewan ji bikin. Ma ci li we qewemiye.

— Tu tiş nîne, min bi van qehremanan re yarf dikir.

— Nizanim, lê gelo wextê wextê yariyê ye.

— Ma ne çêtir e ko em bi rûne bi ken herin pêşîya mirin.

— Heye ko welê ye. Lezê bide xwe û işe van caméran biqedîne; min divêt ez bi te re biştexilim.

Esker ji piyan diseokinin û li hêviyê diman. Katerinê súse da wan; wan ji tişte tê de zûka daxistin zikên xwe û terka kantfnê dan. Di vê navê de guleyek di nîzingî kantinê de teqîya. Fédor gote Katérfinê:

— Üris dixwazin me bîbi/dihînin. Lê na-keve serê min ko işev bikarin rabin hicûmê.

Katérfinê lê vege raund û got: Ma ci ferq heye, ha fro, ha sibe.

— Nc Katérfinê hole mebêje.

— Ez li pêş xelkê ve nabéjimdizanim ko pê manewiyata wan diskêt. Lê herçî tu kurê serfermandar, ji xwe ber dizanî ko saetên Maryenbûrgê hêjmarts ne. Ancax micizeyek dikare me xelas bike.

Kecikê wextê ev tiş gotin du hêstirên germ di ser hinarakên wê re herikfn.

Fédor got:

— Sed heyf û mixabin ya Katérfin ... Ma

em nikarin ji bajare xwe re tevdireke xelaskar peyda bikin.

— Ez di vê riye de canê xwe didim.

— Ez ji, lê tu tişti ji min nayê; jê re jini-kek divêtin.

— Ev e, ez . . .

— Belê, ez ji li te fikirîm.

— Min ji te gelek minet e; bêje min ci divêt ko ez bikim.

— Îşekî dişwar e ya Katérin, ditîrsim ko ji bo miîen jinikek barekî girah be.

— Ez ji tu tişti xwe nadim paş û ji tuke-şî natîrsim.

— Jiyâna te bikeve talûke ji . . . te qenc daye eqîlê xwe.

— Ne' Hewce ye ko ez bidim eqilê xwe. Ma ci qismata jiyâna min heye; ma min mirov hene min mîr an destgîrîf heye; ma di vê dînyayê de çiyê min heye? Tucaran ji ne hate bîra min ko ez ji bedewiya xwe istifade bikim. Ez xizmeta van eskeran dikim; lê bi min be ez ji bo îşekî din hatime dînyayê. Belê bi tenê di xizmeta welatê xwe de ez dikarim bi kér bêm û pê bibim jinikeke din.

— Hingê . . . tiwê bikarî herf û bikevi nav xetêni dijmin.

— Béşik . . .

— Ü heke hewce bû zilamekî ji bikuji?

— Ji xwe beriya niho ji min zilamek ku tiye. Hêj piçûk bûm, yekî dixwest min

birevîne, min ew kuşt. Bêje ci divêt ko ez bikim.

— Bi min re were, bavê min ewê her tişti ji te re bibeje.

— Kêlikê li hêviya min bimîne, ez hatim.

Wextê Fédor derkete derve. Katérin pora xwe edilend û hinek podre li rûyê xwe gerand û da pey Fédor. Di pey wi re bi gavine eskeri dimeşîya. Guleyén dijmin li pey hev diketin bajér. Qey dijmin bi halê wan hesiya bû û dixwest lezê bide xwe û saetekê berfî saetkê bajér hêxe destêni xwe.

Gihastî bun qerargaha serfermandar. Fédor Katérin ji bavê xwe re da nas kirin. General keçik da rûniştandin û ji kurê xwe re got ko wan bi tenê bihile. Général gole Katérinê:

— Te dil heye, tu canê xwe ji bo Lî-wanyayê feda biki?

— Min hergav dil hebû; lê heta niho tu kesî ev tişti ji min ne xwesti bû.

— Ne xwe, heke min ew ji te xwest . . .

Katérinê ştexaliya general birî û got: Ko ez bikevim nav xetêni dijmin û zilamekî bi kujim . . .

— Kê ev tişti ji te_re got?

— Milazim Fédor.

— Belê rast e; navê mirovê ko tu bikuji ji ji te re gotine.

— No, ew tişti ne gotin. Lê ev ne tu xem e; üris hemî weke hev in. —

General li ber vê xwînsariyê hişmetkar ma bû. Hinek sekînî û got: Ew mirov, ferman-darê ordiwa rûsf general Mençikof e.

— B: Xwedê li min xweş e, berf hinên din ez wi zilamî bikuji.

— Le divêt tu bî-zanî ko bi vî işî tiwê t rka jiyinê bîdi.

— Herwekf min ji kurê te re ji got, ne tu xem e.

— Heye ko tiştekî din ji winda bîki . . . namûsa xwe.

— Namûsa xwe.

— Belê, ma tiwê çawan bigehî çadira general û pê re xwe bi tenê bîki.

— Madam di pist re



Jînîne Ingîlîstanê di xizmeta welatê xwe de salimina dibînin.

ezê wî bikujim, ev ji
ne tu xem e.

— Ü heke işev te
Mençikof kuşt . . .

— Sibe wê min bi-
din b.r tisfingan

— Lé heke me karî
bû em te xelas bikin,
hingê şan û şerefa din-
yayê û maleki mezin
wê ji te re bit.

— Tiştên ko tu di-
bêjî ev hemî di her
çavén min de bê
qîmet in . . .

— Bi kuştina ferman-
darê wan ordiwa rûsf
wê bikeve berdiberdanê
em ji emê ji vê fîrsendê
kar bikin û emê rabin
berêrîsekê û wan ji we-
late xwe derinîn. Bi vî
awayî em dikarin bige-
hin silheke şerefnak.

— Ji bo işeki eva
çend mezin ji min
ewle yî.

— Bi temamî.

Katérinê bi dengekî xurt û bi vêngot: Bi
dilxweşyeke mezin ez vê. we. ifê li ser xwe
digrim. Lé ezê bi ci awayî bikevîm nav xelêm
dijmin û xwe bigehînim Mençikof.


— Ev ne tu tiş e. lîvî blî rahett bigehî
heta qerargaha Mençikof. Bi tenê divêt tu tev-
direke welê pêk binî ko tu bikarî bi général
re xelwet bibî. Ji bo vê yekê ji divêt tu ji lîr-
nekî ko tu spehlî yî û Mençikof hej delalan dike.

Di wê navê de général Mençikof di qerâr-
gaha xwe de zabîtên xwe ëh erkanherb da bûn-
dora xwe û ji wan re digot:

— Li gora raporên ko mixabirên me ên
sîr ji min re rëkirine, keleha İstwaniyan a
pasin û asê di van rojan de ji xwe ber wê
bikeve desten me. Di kelebê de tu qwit ne
maye; xelk û esker ji nêz û bîrçınan gîhastine
halekî welê ko nema dikarin pê bidin erdê. Ji
lewre ji me re divêtin em li şuna ko li hêviya
ketina wê bimîn û berfî ko kelebî ji xwe ber
bikeve em wê bistînîn û ala qeyser li ser
surehîn wê daçikînin.

Kulnêrê pîr Orlof got:

— Tiştê ko général dibêje qehremani ye.



Jî fabrikeyê Ingîlîstanê: Fabrikeke balaşiran. Di vê fabriké de bedena
balaşiran saz dikin û paşê aleşen din li wan siwar dikin.

Lê neyarênen qeyser zehf in; heye ko em jiyîna
eskerîn qeyser bê zerüret bêxin talükê.
Lîtwaniyen ko tengezûr bûne heye ko gelekk
li ber xwe bidin û kuştareke mezin di nav-
bera me de cêbibe.

— Belê rast e; lê li gora plana ko min
çekirîye mixdarê eskeren ko divêt em fedâ
bikin hindik e. Firqa piyadan di bin
perda ağırê topçîyan de, wê berê xwe bide
tabyeyen bajêr ên hember. Dijmin heta ko ew
nîzîngi wf bibin û ji wan re bibin armanceke
eskere bera wan nadin. Di yek wextî de fir-
qeke din ya ko di nav daristanan re û ji ker
ve vehîlikse jor, ji aliye bakur-rohêlê de dirêjî
kelebê bikit.

— Ew der cihekî gelek asê ye û tê re
çûyîn ne hêsanî ye.

— Belê... lê plana min ne welê ye, her-
weki tu dizanî. Wextî İstwanî vê hicûma ko ji
du aliyan têt dê bîmîn ewê bawer bikin ko
hicûma hember hîfleyek e û hicûma rastîn
ji bakur-rohêl ye. Li ser vê yekê piraniya
eskeren xwe wê bişînîn bakur-rohêl. Hinge
sê firqeyen din wê bidin pey firqa pêşîn û di
nav saetekê de Maryân bûrg wê bikeve destê
me. Xesareke sivik wê bigehe firqa pêşîn.
[Dûmahiîk di rûpelê 20 an de yê]

JI LAWAN RA

Lawol Tu dizanf çira em
hev nabinin; çira axa me reş;
esmane me tarî ye?

Efritan pêsiya ronayiyê
girtiye.

Lawo, tu dizani çira em
nikarin hilmeke rahet bikêşin.
Em difetisin, dengê me derna-
kevê, dest û pê me nalipe.
Déwin li ser sîngên me
rûnîstine

Çira rûyê min zûr bûye?
Rast e, em hev dibînin. Roj
derketî, tavê li erdê daye,
gul û sosinan hér der xemî-
landiye. Welê eva ronaiya ko
ez dibêjim ne ev e. Ev ro ra
dixwazim li demê ji dew-
ranê li ser kuçen bilind ên
Agirî li nav aqîre bomb û top
û tifing û mîtralyozan ji nav
birqe-birqe şûr û xencer û
rim û nîze li ser rûyê kefenên.
sîp can bêzaran helatî; li ser
xwe xûnên sehidan ên sor û
miqedes, sehidîn din û mil
girti. Di pey xwe ra ser sînga
hêşnatiya axa Kurdistanê danî
bû. Germiya tijavê toximê

azahî ra li dilê kurdan hêşin,
kezebêñ neyaran qul qul kiri
bû. Xew ji çavêñ xasibêñ he-
qêñ kurdan ra heram, xorlêñ
kurdmancêñ bêgovang ra
kiri bû.

Arê, lawo arê, ewê tavê
dibêjim ko tariya qrûna dilen
kurdan ra rakirî; çavê dila ra
ronai da bû; toximê kîn û
neyartiya hev, ko dijminen me
li vê tariya dil da çandî, hev
dû ra ku-tin didan û ligel
xûnên pak kurdêñ cahil û
bêxember acur çedikir; ximêñ
û hisarêñ koxikêñ celal û
ceberûñ xwe mijkem û bilind
dikirîn; xôşkanot

Lawo! Ew ro ra dibêjim
ko bona helandin û hûr hûr
kirina zencirên zilm û dilê
dest û peyên kurd helatî, dema
tewafa gebrêñ sehidan ên bê-
kêl, sehidîn din û milet xwari
erdê bû bû. Li nav çengalen
dew û efritan giristar bûyc.

— Babo, meger nikarin
eva dêw û efritan bikujin, roja
kurdan disan ber bi esman kin.

— Lawo, tu zar i, eglê te

nagihfje; devê birfna dilê min
vemeke û xweyê pê ver meke.
Hîviya min ji Xwedê heye ko
rojek wê were, axa me jî mîna
axa cînarêñ me bi ronî be.

— Babo, meger iñarêñ me
dêw duşline, roja xwe derxistin.
Çira kurd naqedînin. Me-
ger wana ji kurd mîrxastir in?

— Ne kurê min, mîrxas
nînin, aqil in; li her karî yek
in. Civata wan heye, bi hev
dişewirin. Ne ko mîrxasî navê
nîjadê me ye; nîşana me ye.
Lê li dînyayê ji kurdan mîr-
xastir peyda nabin. Dayîkên
kurd zarê xwe li çiyan û banî,
di newal û deştan da tînîn.
Çawân ko tev xûn têñ dînyayê,
dema diçin ji li serî ligel xûna
xwe dialin; sor têñ sor diçin.
Çavêñ kurdan da jiyyîn û mirin
yek e. Mîrén kurd ne bi jiyyînê
şa, ne bi mirinê xemgîn in.
Tenê li nav kevir û kuçen
bilind, li newalîn kûr de
xûyêñ hev ra girtine. Ji kuş-
tinâ hev ra zcr jêbatî ne. Ji
êñ din xwe vedişerîn; zû zû
xwe bernadin, dest bi tifing na-
kin. Dema ko kirin, erd
û esman li ser serê
neyaran hildiweşinîn.

Kurdan mîraniya
xwe li deşten Xîndî,
Xarpêt, Diyarbekir û li
geliyîn Daraheñê, Dêr-
sim, Midyat û Botan, li
şax û daxêñ Sipan û
Agirîye de nîşan daye.
Dema dil bikin pola
dihefinin, çiyan diheji-
nin. Ldi ecel û mirin
nikarin pêsiya wan bi-
girin.

Çaxê heft siwar û
an de peyayêñ egid li
erê Kanikorkê, li rasta
Beyazidê di bin teyroka
mîtralyozan da rikêba
ser mifrizdeke dijimin
kirin, merof digo li ehda
sehaban de ye, weko



Eliyê reş zilfiqar kësaye ber xwe daye koma kafşan. Gava nêzik bûn, mîna gur keti be nav pez. Kumandarê fir-qê top bi timobla xwe girêda, revand û welê xelas kir.

Dijminan gazind ji bextê xwe û aferin bi méraniya kurdan dikir.

Rojeke din, heft mérên boxe e şemkan rikêba nêzîfî çar sed siwar û peyan kir. Wan heft peyan dijmin mîna pez aveti bû pêsiya xwe û dajot. Kumandarê dijmin destûr topçiya xwe da ser wan şérén nér guleyan navêje, bi bê-bextî nekuje.

Heyf, lawo, ewan şeran bi temamî bi bê-bextî hatine gitlin û kuştin. İro rûh wan e pak li me dinihêrin, Dinihêrin ka bibînîn em héjayı fedakariya wan in. Dinihêrin ka em dikarin tola wan bigirin, di riya wan de herin. Beyda a azahiya kurdan ya ko wan vekiri bû disa li ser sax û dax û Kurdistanê daçıqînnîn.

Ev jî bi tenê bi méraniye çenabê. Ser zanîn û pêkanîn û girêdana dest û peyê wan dêw û efrîtan ji divêt. Belê jê re esasên jérin gerek in:

1 — Ji şivan û gavanan heta mîrê mîran divêt kurd bizanîn ko brayêñ hev in; ji da û babekî çêbûne. Xûna wan yek, namûsa wan yek, teesiba wan yek e, jiyan û mirina wan yek e.

2 — Zanaî û zor serkaniya xweşiyê ye. Dan-zanîn esasê azahiya milet e. Yek jê bi xwendinê, e din bi yekbûne çêdibe.

3 — Bawerî û itaeta piçûk ji mezinê xwe ra, şefqet û himayet û mehebeta mezin ji piçûkê xwe re.

4 — Navê Neyartiya eşîran ji navî kurdan



Jinê Ingîlistanê di bexçeyen dora Londre de bacanêñ sor didin hev



îner sui di meydâname Londre de beza hespan çêdibin.

rabe. Bi hikmê şerîta mihemedî herkes ji kirina xwe mesûl be; bab, bira, pismam, cînar ebeden tev nebe. Teesiba mîli şûna teesiba eşîri bigire.

5 — Hemû miletê kurd di dora civateke milî bi bigehe hev.

Dema ko ev tişt çêbûne berê miletê kurd her bi esman e. Rûhêñ bab û bapsîrên wan Kiyomers û Temors û Cemsid û Feridûn û Keyqubad û Erdeşirê babek û Selahedînê eyûbî û Kerim Xanê Zend şâ ye.

Armanc, ciyê bab û kalê kurdan e kevin û mezinatiya berê peyda kirin û tava kurd di welatê Cemsid de ji nû ve bi esman xistin e.

Lawo, te seh kir, ji min dibihure, hîvji te-ye.

IHSAN NÜRİ

RIYA EZMAN'AN

ŞEREVANJ DI RIYA EZMANAN RE ÇAWAN
ESKER ÇEK Ü POSATEN XWE DIGUHESİNİN

*Di vî şerî de guhastina' esker û her texlit
çek û aletan bi balaşiran û bi piraht û ji bo
cara pêşin di şerê girava Girtî de cébû bû.*

*Elemanan piştî vegertina welaşen Balqan-
nan ji Yewnanistanê xwe di riya ezmanan re
zer kiri bûn Girtî. Di riya behirê re nikari
bûn biborigana. Ji ber ko stola ingilzî riya behi-
ran dipa. Hingê herkes li wê niwefeqiyetê ecêb-
mayî ma bû.*

*Lê di şerê Normandiyê de wextê heval-
bendan berda beja Europyê; ingiltz û emîrîka-
ni di vî têt de ji elemanan gelekt pêşîr çûn û ji
wan derketin.*

*Ingiltz û emîrîkaniyan xwe, ji mîj ve kar
dikir. Nemaze ingiltz ji roja ko Frans
şikesti bû û eskeren britani ji Dûnkérkê vege riya
bûn, Çorçîl li tevdîrina digeriya ji bo ko rojekê
vege Europyê.*

*Li 6ê Hîzîranê britani digel emîrîkaniyan
vgerigane Europyê û bireki eskeren xwe di
riya ezmanan re guhastine*

*Dilê me he di vê bendê de hin tiştan, li
ser guhastina eskeran di riya ezmanan re,
berpeyl xwendevanên xwe bikin.*

*Eskerén ko di riya ezmanan re têne guha-
tin du texlit:*

1—Peraşütistî. *Evén ha eskerine xweser
in; ji bo vê yekê têne talîm kirin û ew esker
wextê balaşir digehî ser erdê negar deriyê
balaşirê vedikin û digel çekén xwe, xwe tavê-
jin zikê ezmén û xéra siwana vegirtî hêdika
dadîkevin erdê.*

2—Eskerén di ezmanan re guhasti. *Evén
ha eskerén adettî ne, li şûna ko bi wasteyîne
din bêne guhastin, bi balaşiran têne guhastin
û piştî ko balaşir datinîn jê pega dibin. Lê ew
ji eskerine bijartene û wan jî lalîmine xweser
dîtine. Ji ber ko carina balaşira wan dattine
orta negaran û heta ko hawara wan bê xeba-
teke zor dixebeitin.*

**Ji bo guhastina esker û çekan du celeb
balaşir hene;** *yên adettî yanî bîmotor. Bi
wan çek û eskirine hindik têne guhustîn.
Herçî ko ji bo guhastina yekînekan in,
tabbr, alayî, firqe h. p., ew balaşarine bê
motor in. Balaşirén biomotor wan ji par re bi
xwe ve girêdidin û di ezmanan de wan kaş
dikin. Bi gotinén din balaşira bîmotor lekomot-
iv e, ên bîmotor ji fergon in.*

*İçar li gora nîzama balaşirvanîya britani
tepkîlata riya ezmanan bi awayê jérîn e.*



Ev ji eskerêk e. Eskerekî bi dest û lep û ber-bi
çav. Ev eskerê boke dike zinarekî qui bike, dîna-
mitê di wî ke û wi berhewa bike.

*Di cihine Ingîstanê én têvel (mixtettif) de
ji bo guhastina eskeran balaşargehîn hene. Di
wan balaşirgehan de balaşir li gora karê xwe
lêk vekerine. Balaşirén ko peraşütistan tavêjin;
yên ko balaşiran kaş dikin û balaşirén bê
motor.*

*Di rex wan balaşirgehan de talîmgahîn
hene. Di wan talîmgahan de peraşütist û
eskeren ko bi balaşirê têne guhastin dîsekinin.
Di ciheki talîmgahê de ji balaşirvanên bala-
şirén bê-motor yanî fergon, talîm dikin.*

*Ev esker û balaşirvan piştî ko yekîne
talîm dibinîn, digehîn hev û pev re menawran
çedîkin. Ji wargehê xwe radîbin û datinîn
erdektî din. Bi vî awayî dahatîna erdê negar
diceribînin û hîni hevkariyê dibin.*

*Wextê hereketê hatîge, balaşirên fergonkêş
di kevin pêşîyê; ên bêmotor bi wan ve grêdidin.
Li én bêmotor esker siwar bûne û aletên wek
motosikl û timobiline piçûk jî li wan hatîne
bar kirin. Fergonê bi balaşir vej girêdidin
û balaşir hêdi hêdi dimeşe, paşê hêz dida xwe,
bi hewa dikeve û fergona xwe ji bi xwe re
hiltîne. Balaşir û fergon wek qeytarektî trênan
di ezmanan de bîlind dibin. Bi vî amayî*

jî her balafirgehê trêna
balafiran pey hev ji
erdê dibin û di ciheki
ezmanan de trêna tev de
digezin hev û jê berê
xwe didin erdê daketinê.

Di naubera pilotê (yê
ko diajo) fergonê û
yê balafira bimotor
téléfonek heye. Wextê
digezin di ser erdê ko
rsker dikin peya bibin,
her du pilotan bi
téléphonê bi hevre xeber
didin, û di cihê ko li
pilotê fergonê têt balafira
bi-motor têla ko fergon
pê girêdayî ye vedike
û fergon bi tena xwe
datêt erdê balafira bi
motor vedigere warge-
hê xwe.

Jî xwe beriya wan
bi çend saelan eskeren
peraşütist daketinê û ji
wan re erd xweş kîrine.

Bi her eskeri re ji
bo danekt an du danan
xwarin û têr cebirxane
heye. Hergi pilotên
fergon in, heke ji wan
hat, zûka vedigerin
wargehê xwe, da ko
fergoneke din bajon. Lé
heke ji wan ne hat ew
ji bi şerêvanîye re
pardariya şeri dikin. Ji
wan balafiran re, yani
balafirê bêmotr re
planor dibêjin. Nîho
ko xwendevanén me zanîn ew ci tişt e, em
ji emêjê re planor bibêjin. Pilot ji hemi
dişayoyen balafiran re tête golin.

Bi wan eskeran re keşe ji hene. Wan
keşan du wezîne hene. Di deravêng teng de
nav di eskeran didin, li şâna nexweşnéran
birtnêñ birtdaran derman dikin û wexlê mirî
hebin keşetiya xwe dikin û dia miriyân
dibêjin,

Di peg wan re di planorine din de diktor
û dermanker û nexweşnér tén. Bi wan re her
textilt derman û aletên cerahiyê hene. Di ciheki
de tavil emeliyalxaneyek saz dikin û bi emeliyalta



BIRGEHINE QESIR Û AVAHİYÊN SKOÇLANDÊ

birtndaran mijûl aibin. Ne hewce ye ko em
bibêjin ko ev tişt hemi heta erdeki fireh bîkeve
dest, di bin barana gule û berikên dijmin de
çêdibin.

Ev eskerê ko di orta dijmin de ye heta ko
bi bejê an di behirê re bigehe ordiwa xwe
hewara wi di ezmanan re têt. Gelek caran
balafir bêt ko deynin ji jor de tiştên gerek ji
wan re tavéjin.

Di şerê Normandiyê de hevalbendan bi vî
awagi, di riya ezmanan re, firqeyine tekûz bi
her çek û tangên wan ve, guhastine erde
Europayê.

PISPORÊ ESKERI

— Dûmahîk ji rûpelê 16an —

Di wê demê de nobetdarek kete hundir û ji général re da zanîn ko qasidek ji Pêtrêsbûrge hatiye. Qasid nameyek (mektûb) ani bû. Mençikof name vekir û gote haziran.

— Mirzano nameke imperatorî.

Tev de rabûn, ji piyan sekinin û pate lêxistin. Mençikof nama qeyser xwend. Qeyser ferman dikir ko vegirtina Maryenbûrgê bîlezinî. General bi dengektî teşî vêñ û irade gote zabitên xwe:

— Divêt fermaña qeyser işev bête cih.

Li ser vê gotinê zabitan terka general da û hemi çûn ser işen xwe. Mençikof di çadira xwe de bi tena xwe ma û vekës tantîn xwe. Ji çend rojan de gelek diwestiya.

..

Perên şevê ên tarî dakteki bûn râyê dînyayê. Katérinê terka bajêr da bû û keti bû nav xetên rûsi. Nobetdarekî rûsi deng lê kir û got: Ew ki ye?

Katérinê lê venegerand; pêş de çû, beta ko riviniya agirê ko eskeran dada bû jê ve xuya kir. Nobetdar careke dîn got: Ew ki ye, bisekine, an ne ezê agir bikim.

Katérinê got: Jinikeke litwani ... Nobetdar berê tifinga xwe li singa Katérinê rast kiri bû. Dikir ko agir bike.

Katérin di cihê xwe de cemidi ma. Ji xwe re digot: Ev hovê ha dikare min bikuje.

Wi eskeri bani zabitê xwe kir. Zabit digel çend eskeran qedimi. Esker digot: Jinikeke litwani.

Katérinê: ma beriya niho we yeke din ne dîti bû, ehmeqino.

— Ker be... an ne...

— An ne... bi Xwedê tilike xwe bidî min, fermandar beriya ko roj hilê te bi dar ve bike.

Esker wek vecinîgi bi xwe de qeliqi û got: Tu kî yi, navê te çi ye?

— Beri her tiştî min bigehîne general.

— Tu dibêjî qey tu işe general nîne hemâ wê bê pêrgîna te.

— Ma jî kû dizanî ko ne welê ye?

Mêrik kenî û got: ji dil tu cesûr û bi vîn i.

Katérinê bi awaki welê xeber dida ko esker ketîne dudîlîyê û ji xwe re digotin: Heye ko general li héviya wê ye. Zebîlê ko qedimi bû neferek şand ba yawerê general da ko jê re bide zanîn ko jinikeke litwani batîye heta xetêni rûsi.

Neferê ko çû bû qerargahê pistî midekti vegeriya û got ko divêt jinika litwani bibin qetargahê. Zabit gote eskeran: we jinik velo kiriye.

Eskeran got, no, me ew seh ne kiriye.

Katérinê: Ez qebûl nakin ko ev wehşiyên ha destên xwe bidîne min û min velo bikin. Heke zabitên rûsi ji jinan ditîrsin hingê ezê xencerâ piçûk ya ko bi min re ye, bidime te û wextê yên me direjî we bikin tu dikari pê bêrekiyâ canê xwe bikî.

Zabit li mîrauniya jinikê ecêbînayî ma bû. Dev ji velo kirina wê berda û gote jinikê.

— Herhal, te mexsedekh heye.

— Min ji eskerên te re goti bû; ez di-xwazin general Mençikof bibinim.

— Nakeve serê min ko wextê general hebe te qebûl hîke, digel vê hindê ezê carekê biceribinim.

Zabit li hespê xwe siwar bû û berê xwe da çadira general. Wextê zabit kete çadira general Mençikof jê pîstî.

— Te xêr e Eleksiyef,

— Tiştek nîne, jinikeke litwani,

— Jinikeke litwani, ji kû tê û çi dixwaze?


Bî xwe hatîye heta xetên me û dixwaze general bînîne.

Cawan e, spêhi ye?

Bele spêhi ye, lê jinikeke xurî û bi vîn.

Ka wê ji min re bine; heye ko bûkare min bikenine.

(Dûmahîk Heye)



HINDIK RINDIK

40,000 KİLOMÉTİR — Herwekfí xwendevanen me dizanin elemanan birekfí Sovyétistanen í mezin vegirti bú. Lé ordiwén Sovyétistanen én qehreman, dijmin bi sun de vegerand ù erdë xwe ji ber lepén wí xelas kir. Ew erd xerabe bú bú, píraniya xelké wí jé derketi bú. Nibo xelk lé vegeriyane ù bi arikariya hikümete erdë xwe ava dikin. Hikümet ji wan xelken re pez ù dewar jí peyda dike.

Welaté úrisan welatekfí békeder mezin e; digehe peré dinyayé. Hikümete ji her derén welet ji milyonek serf békir pez ù dewaréen stür dane hev. Ev pez ù dewar li erdén xerabebuyí bihatana leva kirin. Ji guhastina wan re 90000 fergon ù qedere 1000 lekomotiv diviya bú. Qederé meheké jí réhesinén welet pír bihatana mijúl kirin.

Hikümete teşkilaté anf pír ù di 23 reyén xweser re ew pez ù dewar di bejé re ajotin cihén gerek. 25000 şivan li wan kerian guhdar dibún. Di 880 deran de beytarxaneyin hati bün saz kirin. Di wan beytarxanan de heywanen nexwéş dihatin derman kirin.

Bi wí awayf ew heywanen ha yén ko ji milyonekfí békir bün ne bi tené bi selamet gihaşlin cihén xwe, lé bi rí ve li xwe zéde kirine jí. Ev e xurtiya teşkilaté.

RAHBE — Beriya ko sondxwarfí pír li beja Ewropayé bikin balafirvanekí britani keti bú erdë Belçikayé, nízingí déreké. Eleman pír ne hesiya bün; rahbeke déré balafirvan díti bú. Rahbe balafirvan anf déré, jé re destek cilén rabban da wergirtin. Mérlik rojé çend caran rih ù simbelén xwe kur dikirin ù békeng di nav raħaban de digeriya.

Du meh keti bün navé. Rojeké m'riké me di Ifwaneke déré de rasfi rahbeke ciwan ù spéhi hat. Rahbe bi tena xwe bú. Mérlik me nemerdí ne kir, hemma baz da ù jí par re rahbe himbékir ù dikir ko wé maç biże. Rahbe lè zivili kulmek li bin erzina wí xist ù békengki stür got-é:

— Tu dibi ne pér batı, ji niho de bi xwe nikarı; ez ji roja seré Franseyé de li hire me.

EMRÉ HIN HEYWANAN — Masiyin hene qedere 150 sali emir dikin. Kitik 10, se 11 ù herçí hesp heta 25 salan dijín. Hüt 200 ù fil qedere 300 sali dikarin emir bikin.

JÍ CİROKËN YEWNAVISTANA KEVIN:

Círa Zaniné

Li wexté beré miletek hebù, miletek mér ù ciwanmér, lé nezan. Ew milet keti bú bin des-tén milete din. Mileten serdest zilm ù sitem-kar lé dikirin. Milete bindest ji heyna xwe bëzeber, di bin nitré mileten serdest de hero belengazit dibù. Lé milete ji her tişt bë hay, bi belengaziga xwe jí ne dihesiya.

Rojeké, pírek ji nav wí milete bindest rabú. Pir li halé milete xwe temaza kir; li ser ne-xweşiya wí vebú. Kal rabú, elfabeyek çékir ù milet da xwendin. Wí pír li xelké xwe pend ù ştret dikirin ù digot:

Zarono, li zimané xwe miqate bñ, pihét pír bigirin, hñt xwendin ù mivsandiné bibip; qedre zmané xwe bizantin. Miletek dil yé ko zimané xwe winda ne kiriye dimine wí hepşigé ko mifte zindana wí di desté wí de ye.

Belé, zimané we heyna we ye. Hon bi tené bi ziwané xwe ji milete din tène ferq kirin. Ü rojeké honé xéra wí ji hestrige xelas bibin.

Milet ji ya pír kir, hñt xwendin ù niut-sandiné bú. Xéra zaniné li her tiştén dinyayé hisyar bú; bi heyna xwe hesiya.

Belé, milet zan ko heta hingé di zindana nezaniyé a tarí de pâyan dibù. Círa zaniné dora milet bi roni kir. Milet her tişt díttin.

Zorkeran di tariyé de li wí dixistin, milet go ne didit. Lé gava zaniné havir bi roni kir, milet çoyé zilmé di ser xwe re dít, ew girt ù ú ew şkénand; beré xwe da deriyé zindané jé derket. Ji ber ko, herwekfí pír goti bú, mifte pír re bú.

Wegl jí wí milete re ka zimané xwe winda kiriye. **HEREKOL AZIZAN**

HINEK JÍ HENEK

Prefijnek di kúckeke Londré de bi rí ve dici, Guregur bi ezmanan ketin. Jí nik tisla ù li zérzeménék geriya, da ko xwe tê de ve ère. Yekí got-é:

— Xanim metirse, ev ne guregurén Hitler, lè yén Xwedé ne.

Dibéjin ko rojeké rojnamevanekí blyant ji serskwezfí Mecaristané pírsi;

— Mela hikümeta we jí ké re çétir heye, ji elemanan re an ji sondxwariyan re?

Serskwezfí lè vegerand ù got: Herçí ez ù birekfí wezfrén min em mëldarén elemanan in. Herçí ez ù birekfí wezfrén min en dnem mëldariya sondxwariyan dikin.

INQILABA SOR A MEZIN

— Em cengê naxwazin!

— Me Qeyser navê!

— Her bijî koma milet...

Di meha maria 1917 de bû; bi herzaran pale û xelkê Petrêsbûrgê girûh-girûh, di kuçeyan de digerîyan û ew pirsên jorîn bi hev re û bi yek dengî digotin...

Qeyser û malbata wî û zadeganan, ji paş pençereyan, li van komên rîncber, pale û ciwelekan dinêrin, qeh-qeh dikenîyan û digotin:

— Zûrina van seyan em gêj kîrin..

Bi rastî ji Qeyser û zadegan gêj bû bûn. Lë ne gêjbûneke tebiş, gêjbûneke siyasi bû.. Ruyê wan, heke bi sextekarî dikenîya, dîlê wan bi rasti digirîyan, taxâ mirîn bi qirika wan girtî bû, text û bextê wan dihejiyan.

Ev hal ne tenê di kuçen Petrêspûrgê de çedibû; li welatê Ûris, li her cî qewimî bû.. Pale, rîncber û ciwelekan azadî û serbestî dixwestin.

Mina her derê, li Ûristanê ji milet tebeqe tebeqe bûn: Zadegan, bajarî, gundi, pale, rîncber, ciwelek..... Bajarî (bûrjawî) tebeqeyen navîn, zadegan tebegeya serdest, pale, rîncber û ciwelek bindest bûn. Zadegan bi keda wan dijiyan, bi keda wan zewq û sefa derbas dikirin, her çeşid cewr û cefa li rîncber û paleyan dikirin.

Di bablîska nozdan de cara pêşin, Karl Maks derket meydanê û ev nîzama civakî. nîzama tebeqeyan [a tewş qebûl ne kir, û fikrên xwe ën marksî pêş ve ajot..

Karl Maks, digot «însan e, xwîna ku di damarê wan de digere, giş sor e.. kes xwendiyê xwîna kesk nîne û heqê tu kesî tune bi keda xelkê bijî, û ew kes bi xwe bê kar û bê emel be...»

Inqilaba Fransa a mezin (1789) ji, li ser bingehêkî wisan çêbûye û ji wê rojê ve, pozê zadeGANîYê hatîye şkandin û her kesî lezeta azadî û serbestîYê tam û fam kiriye.

Mizgînbîlav «mîbesîr» ê fikrên marksî û qehreman û fermandarê inqilaba bolşevîkî «Lenin», navê wî ê rastî «Vladimir Ilyanov» e. Di sala (1870) de, li (Sibîrsk) ê hatîye dinê. Ji roja ku bîr bîriye, fedaiye azadî û insaniyete bûye û di vê re de bi sev bî roj, mejîyê xwe, bi dest û lepén xwe xebitiye.

Inqilaba (1917) an ku di Ûristanê de

çêbûye, ne inqilabeke ji nişkave bû, ne ji mûcizeyek bû. Na ew, berê dara ku «Lenin» ji si salî ve çandi bû.. Zadê tovê ku Lenin ji salan ve li zeviyen Ûristanê belav kiri bû.. Di zemanê ku nîrê Qeyser hustiyê wî û hevalen wî ba dida.

Lênen hêj hevde salî bû ji darîfînâna Qazanê hate qewitandin. Çima ku tekîf ni-mayîşen seuwrewî bû bû. Di wê salê de birayê wî è mezin «Aleksandir» ji hate bi dar ve kîrin.

Lenin, pir ji xwendinê hez dikir, nemaze pir bala xwe dida kitêb û fikrên Karl Maks û ji wan fikrên civakî hîn bû cara pêşin kitêba xwe a bi navê «Mesela gundiyan» nîvîş û ji sala 1893 ve li Petrêsbûrgê dest bi karê xwe i fermandarî kir.. Berê xwe da siyaseta iştirakiye û berî her tişîf xwest ku karê paleyan rîz û xez bike.. dî' navbera sala 1894-1898 de, partiyek iştiraki demokratî çêkir û fikira inqilabî, bere-bere, belav kir. Rojnameyek bê izin ji derdixist. Paşê hate girtin û nefîyê Sîbirîyât bû.. hetans sala 1900 li wir ma. Li wir ji ji xebata xwe ne dima.

Piştî ku ji menfayê vegeriya teva du hevalen xwe «Martof» û «Tobrison» ji Ûristanê derketin û çûn, li meherçê teva «Blixonof» û «Aklorê» û «Fira Zasolits» rojnameyek bi navê «îskera» — yanî pîrîşk — derxistin. Paşê çûne, Brûkselê. Li wir ji hewin ne kete wan, rabûn çûn Londre dubîr «ixtilaf» ket navbera civata «îskera», bûne du parti. Bolşevîk û Menşevîk!.. Lenin serekî bolşevîka ma; bi navê «Briyod» yanî ber bi pêş rojnameyek derxist. Di (1905) de Lenin vegeriya Ûristanê. Di wê salê de li Ûristanê hemî fikir û nezeriyatîn inqilabî ketin meydana emeli. Di meha çeleyle pêşin de li Moskoyê, di bin fermandariya civata soviyêtan ixtilaleke miseleh çebû; deh rojan xwe li ber leskerên qeyser ragirtin û pê re ser kîrin. Menşevîka ev ixtilala bi xwîn û agir ne dixwestin; wan ji hevalîtya qeyser û bûrjwan dikirin.

Di sala (1907) de, Lenin, disa mecbûr bu, ji Ûristanê bi derket. Sala (1912) de, Lenin ji xalîcîya-sînorê Ûristanê-dest bi cidalê kir. Gava cenga mezin di sala 1911 çebû, isaretên ixtilale bêtir xuya kîrin û Petrêsbûrg dida veciqandin.

Di sala (1917) de ixtilala iştiraki li Ûristanê, di bin fermandariya partiya bolşevîkî û Lenin de xuya kir. Eve serê diroka wergearînîa zadegan û sermayedaran, serê diroka heq û rastiyê, serê diroka azadî û serbestîyê.

Di meha Adara wê salê de, paleyên Petrësbûrgê girêv û nimaiş çêkirin, li kûçeyan bi sed hezaran digerîyan û digotin: « Em qeyser naxwazin... Em azadiyê dixwazin... Her bijî komma milet!... »

Di serê meha martê de agirê ixtilalê gurtir bû; qozak û leşkerên ku qeyser dişandin ser nimaişkaran, teva wan dibûn û bi wan re, li polisên qeyser dixistin.. Êdi, reyek li ber qeyser ma bû: ji textê xwe fîzérin daketin!

Bi daketina qeyser, derbeke mezin li iqtisad û idareyên pê cengê û li rûyê zade-ganan ket. Ixtilala Martê, tenê bi destê gundî û leşkeran çêbû.. pişîf heşt mehan ixtilala çiriya paşîn dest pê kir, Vêcar li her ci bolşevîk serdest bûn... di bin serdariya Lenîn de hikûmetek bolşevîk çêbû. Hingi bajarı «Bûrjwazi» an ji, di bin serekiya prens Lifof û Milikof de hikûmetek çêkiri bûn. Di Nisanê de, Lenîn programa xwe ya ji deh madeyan belav kir. Ev program, mîna bombezekê teqiya. Di pişîf re ixtilala çiriya paşîn dest pê kir. Di llonê de Lenîn, dixwest dawiya her tişti bfine. Lê di meha çiriya pêşîn de, her tiştaff û paqîj kir. Imperatoriya úrisa xûnxwar û xedar hilwehiya, li dewsa wê yekîfî û biratiya miletên sovyêt çêbû...

Di nav heşt mehan de nav û dengê fermandariya Lenîn bi ezmanan ket. Di salên pasin de. wacibên Lenîn hêtir û mezintir

bûn. Lê mixabin mirinê ew ji wan bê par kir.


Pişîf Lénin, Stalîn bû fermandar û serekê welatên sovyêtan. Ev merivê polayf roj bi roj welatê sovyêtan kire bihust, ji miletên wê derê re, her çeşid refah û bextiyarf bexş kir û dike. İro li Üristanê, herkes, li gorî xebat û karê xwe, digêje mirazê xwe.. herkes azad û serbest e. Yek nikare li ê din cewr û cefayê bike û yek nikare bike dû xebata û dinbijî. Mezinaff û biçûkî bi bay û kalan nayê qiyas kirin, tenê bi xebat û têgftinînê..

Di nav miletên sovyêt de yekîtîyek û girêdanek yekta heye. Miletên biçûk û mezinîfîn hîqûqen qewmîf û dînf de qandîf hevin. Her milet bi zmanê xwe dipeyiye, dixwîne û dinivîse..

Kes nikare din û qewmiyyeta ê din tehqîr bike, ji bona vê cezayen mezin têne dayîn.

Li welatê sovyêt de çend gundên kurd jî hene. Ew ji, ji her heqê xwe ên qewmîf û dînf istifaî dikin, Di her gundê kurd de dibistan û kolxoze kurdî hene, rojnameyek bi navê «Riya teze» li wir derdiikeve. Em bi dilxwesi dibihsîzin, darîmîlimîn û lîseyek, encimenek zanistiye jî hene. Libatên vê encimene, salê, bi sedan û ji her çeşidi kitêbên kurdf dinîvisin û didin çap kirin, Daxwaza me, ji bona wan ev e: Her tim pesveçün û serfirazı!

Q. CAN



Kiriyariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê 15 lireyên sûri. — Ji bo welatên din du lireyên ingilizi

Xwedi û gerinendeyê berpursiyar : Celâdet Ali Bedîr-Xan, Şam-Sûriye
Directeur Propriétaire: Djeladet Aali Bedîr-Khan, Damas-Syrie